

**Peyamên hevxemiyê ên xelkê Kurdistanê derheq şehîdbûna desteyek ji pêşmergên PDKÎ**

»»» R:7



*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*
*www.agirimedia.org Hejmar (332)22-08-2018 Buha (1000) Tûmen*

## PDKÎ serbilind e bi dîroka xwe



**Rêwresma 25'ê Gelawêjê li binkeya sereke a PDKÎ bi rê ve çû**

Kurdistanmedia: Di 73'mîn salvegera avakirina Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê de rêwresmek li binkeya sereke a vê partiyê bi rê ve çû.

Nûçegihanê malpera "Kurdistanmedia"yê ragihand ku roja 24'ê Gelawêja sala 1397'an a Rojî li binkeya sereke a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê rêwresmek bi hilkefta 73'mîn salvegera avakirina PDKÎ bi rê ve çû. Rêwresm bi marşa netewî a "Ey Reqîb" û deqeyek bêdengiyê ji bo rêzgirtin ji şehîdên Kurd û Kurdistanê û bi taybet şehîdên çend rojên derbasbûyî dest pê kir.

Piştre "Mistefa Hicrî" lêpirsyarê giştî ê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 73'mîn salvegera avakirina Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê peyamek pêşkêş kir.

Hicrî di peyama xwe de got ku: "Hizba Demokrat, ev hizb e ku ji destpêka avakirinê ve weke partiya girûpek yan jî pêkhateyeke destnîşankirî danekete qada xebata Rojhilat. Ev partî tenê milkê endam û alîgirên xwe nine, belkî bûye milkê hemû rojhilatiyan.

Berî ku ev partî were avakirin û piştevan û bingeha sereke a Komara Kurdistanê be, encama guhertineke bingehîn di danasîna Kurdbûn û Kurdistanîbûnê ye.

Ev guhertin jî vedigere bo wê demê ku civaka Kurdî biryarê distîne cuda ji Kurdbûnê, tevlî cîhaneke din bibe."

Wî got jî ku "Li gora guhertinan, Hizba Demokrat jî, ji bo bidestxistina mafên netew-eya Kurd ji şêwazên cuda mifah standiye. Lê hin tiştên mayînde li cem vê partiyê hene ku ti caran nayên guhertin û ew jî, maf, nasname, xak, welat, wekhevî û kerameta Kurd û Kurdistaniyan e."

Hicrî di derbarê "Rasan"a Rojhilat de jî da xuyakirin ku: "Di "Rasan"a Rojhilat de, PDKÎ di ser dîrokê re derbas nabe, belkî dîrok û niha,

»»» R:2



## Mistefa Hicrî:

**Hûn deryayeke bê binî ne, ku şîpelên we, dijmin dibe`ecînin, masiyên çiya hembêz bikin.**

»»» R:4

## Xwendingeha Azadî

»»» R:2



## Peyama Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistana Îranê bi hilkefta salvegera fermana Cîhadê a Xomêynî

**Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistana Îranê bi hilkefta 28'ê Gelawêjê salvegera fermana şeytanî a Cîhada Xomêynî li dijî netewa Kurd peyamek belav kir.**

ناوەندی هاوکاریی حیزبەکانی کوردستانی ئێران
Cooperation Center of Iranian Kurdistan's Political Parties.
مرکز همکاری احزاب کردستان ایران

Peyam wiha ye:

Di 39 saliya fermana Cîhadê a Xomêynî li dijî xelkê Kurdistanê de

Xelkê mafxwaz û xebatkar ê Kurdistanê!
Welatiyên xweştivî!
39 salan beriya niha di demsaleke weke niha de, hikûmeta nû a Komara Îslamî a Îranê, bi nûneratiya binajoxwaziya mezhebî, ku dix-wast xwe weke DAIŞ'ên van salên dawiyê nîşan bide, di roja 28'ê Gelawêja 1397'an de bi hincetên derew û bê bingeh, êrîşeke berfireh û piralî li hemberî xelkê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê pêk anî.

Tenê neh mehan piştî têkçûna rejîma Pehlewî û di demekê de ku Kurdistan weke giraveke aram dihate binavkirin, li Tehranê, li pişt mêhraba mizgeftan û di tirîbûnên cuda de, gotegot û buxtan li xelkê Kurdistanê û tevgera mafxwazane a wan didan, û bi awayekî eşkere ji bo kuştin û qirkirina xelkê Kurdistanê biryara cîhadê hate standin.

Ji aliyekî ve rêber û îmamê rejîma nû (Xomêynî), Kurd weke kafir û fasid binav dikirin û fetwaya cîhadê li dijî wan da, û ji aliyekî din ve berpirsên din ên rejîmê jî hêzên xwînrij han didan ku xwîna xelkê Kurdistanê birijînin û ev kiryar, helal binav dikirin, û dest dabûn jinavbirin û qirkirina neteweya Kurd.

Wê demê jiyana xelkê Kurdistanê di bin siya hêzên siyasî ên Kurdî û hêza pêşmerge de pêş diket û xweştir dibû. Lê li Teh-ran û navçeyên din ên Îranê rewş berovajî bû, û di hin

»»» R:8

## Sergotar

# Xwendingeha Azadî

N: Kerîm Perwîzî

PDKÎ 73 sal in ku xebatê dike, û di vê zêdetir ji heft dehikan de gellek têgeh û destewaje afirandine, û gellek têgehên din jî guherî ne, û bûye sedema vê ku hin têgehên din ên demserveçûyî jî di nava civakê de nemînin, û bêne jibîrkirin.

Digel bandordanîna li ser têgehan, bandoreke kûr li ser jiyana civaka Kurdistana Rojhilat û tex û çîn û tak û girûpên siyasî û civakî û kulturî jî danîne.

Li ser dîrok û kar û tekoşîn û şaşî û kêmasiyên PDKÎ wekî partiya herî bibandor di qada siyasî ya Rojhilat de, gellek hatiye gotin û gellek hatiye nivîsandin, û hemû jî min jêve nine ku bigihîje asta yek li ser dehan hezar kar û tekoşîna vê hizbê, jiber ku dîrok û tekoşîna hizbeke weha, tenê çend bûyerek di qonaxên cuda de nine.

Ya ku di dîroka hizbên weha de rû dane, xebat û tekoşîna hezaran û sedan hezar endaman e ku her yek ji wan jiyana taybet û dîroka taybet û destana taybet bi xwe hene ku hekî edebiyata devkî, û rewşa xebatê derfetê bide, dehan hezar hemase û çîrokên hêvîxwaziya jiyana azad û cangorîtî ji bo hêvî û armancan, wê bihatibana nivîsandin.

Xwendingeha PDKÎ ji roja yekem ya avakirinê ve heya niha û ber bi siberojê jî, cuda ji hemû ders û perwerdehiyan û nivîsandina hemû destanên dîrokî û neteweyî aliyekî din ya girîng jî heye, bi navê azadiya takekesan û jiyana serbest û serfirazane ya mirovekî ku pênaseyeke serbilindane didê, û ji hemiyê jî girîngtir li her cihî bi serbilindî ve dibêje: Rojek ji rojan di vê xwendingehê de min ders gotiye, û ez fêr bûme.

Xwendingeha azadî, takên Kurdistanê hîn dike ku bifikirin, û wan fêr dike ku derûna wan û rewana wan ji wan girê û kevneşopiyan rizgar bikin, û çavên xwe ber bi rûyê cîhaneke din de vekin.

Di xwendingeha azadî de, rênisansa hizrî û dîtingehî dest pê dike, û kesê hişyar û serwext, lê amadeyê xwegorîkirinê, û bi ruha welatparêzî û xelkîbûnê perwerde dibin, lê ew yek nahê vê watayê ku hemû takek her demekê ku hate nava vê xwendingehê de, rast wisa çê bibe ku armanca xwendingehê ye. Bi xatircemî ve wekî hemû civakek din û hemû xwendingehên din dersxwanên gellek çalak û hişyar tê de perwerde dibin û dersxwanên din jî hebûne û dibin ku kêmtir hewla xwe birêkxistina digel Rasanê û rênisansa hizrî didin.

PDKÎ xwendingeha azadiyê ye, ku dixwaze tak û girûp û jin û civak û netewe û bîrên tak û giştî, û bi awayekî gelemperî, jiyan û xebat û vegeşîna di civaka Rojhilata Kurdistana azad û xwedîbiryar li ser qedera xwe, perwerde be.

weke tewawkerê hev dibîne. Ji ber ku felsefeya hebûna PDKÎ, tewawkarî ye. Wateya vê jî ev e ku bi hatina PDKÎ, xebata rizgarîxwazî a Kurdan karî derbasî serdemeke modern bibe û "Rasan"ê jî weke serdemek dibîne ku me derbasî qonaxeke din bike."

Derbarê qonaxa nû a PDKÎ de jî, ji "Bajar" re got ku: "Bajarên min ên xweştivî, û bê mirazên Kurdistana min, hûn deryayeke bê binî ne ku şîpelên we, dujmin ditirsînin, û serkeftin jî dibe para we. Masiyên çiya hembêz bikin. Ew di nav şîpelên we de ne, lewre divê hûn hêzê bidin wan û hêzê ji wan bistînin. Bila şîpelên we hertim biherikin, hêviya we bilind bin û neyên têkbirin."

Mistefa Hicrî di beşeke din ji gotara xwe de ji wan kesan re ku ji aliyê dujmin ve hatine xapandin, got ku: "Dem hatiye ku êdî tif û le`inetê bidin nanê serşoriyê û vegerin hembêza gel û niştîman. Êdî xulametiya dujmi bes e. Ti emeg û wefaya vê rejîmê ji bo bawermend û hevalên xwe jî nîn e. Pêserojeke geş bidin fikra xwe, ku di vê pêserojê de, temenê reş ê vê rejîmê bi dawî tê, û hûn dimîn bi vî xelkî re, ku hûn bûne sedema bêrêziya rejîmê bi wan, û malên wan hatine dagirkirin û talankirin, û xweştiviyên wan hatine kuştin yan girtin. Êdî dem hatiye ku karekî encam bidin da ku di wan rojan de bikarin li çavên vî xelkê tepisandî binêrin, û bi wan re bijîn. Lewre divê vê derfetê ji dest nedin."

Piştre straneke hemasî bi navê "Ez Gelawêj im" ji aliyê girûpa "Neviyên Qasimlo" ve hate pêşkêşkirin. Di beşeke din a rêwresmê de peykerek bi navê "Hêmaya Rejîma Îslamî a Îranê " hate nîşandan ku ji aliyê mamosta "Aram" hunermendê naskirî ê bajarê Silêmaniyê ve hatibû çêkirin.

Mistefa Hicrî lêpirsyarê giştî ê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, û Peyman Qilîc hevjîna şehîd Şehab Heyderî û mamosta Aram perde ji ser vî peykerî hildan.

Mamosta Aram jî di derbarê vî peykerî de axivî û got ku: "Ev peyker, hêmaya rejîmeke dîktator e ku her roj û her heftî, xelkê bêdesthilat û azadîxwaz ê Îranê li darê vedike".

Piştre peyamên Yekîtiyên Xwendekaran, Jinan û Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê ji aliyê "Cemal Fethî" endamê Desteya Rêveberiyê a Xwendekaran ve hate pêşkêşkirin.

Di dawiya rêwresmê de, her du hunermend Xulam Fatihî û Birwa Dilzar straneke şoreşgêrî pêşkêş kirin.

Hin partî û aliyên siyasî peyama pîrozbahiya 25'ê Gelawêjê şandibûn ku ev in:

Yekîtiya Niştîmanî a Kurdistanê
Partiya Demokrat a Kurdistanê
Partiya Şiyû`î a Kurdistanê
Tevgera Gorranê
Asayişa Rojhilat a Hewlêrê

Herwisa roja Înê rêkefta 26`ê Gelawêjê jî li binkeya Cêjnekanê ya PDKÎ, rêûresimek bi boneya 25`ê Gelawêjê, 73.mîn salroja avakirina PDKÎ bi rê ve çû.

Ev rêûresim bi xwendina sirûda neteweyî a "Ey Reqîb" û ragirtina bîstekê bêdengî ji bo rêzgirtin ji canê pak yê şehîdên Kurdistanê dest pê kir.

Piştre "Kerîm Perwîzî" endamê Desteya Kargêrî a PDKÎ bi vê boneyê ve peyamek pêşkêşî kesên amadebûyî kir.

"Kerîm Perwîzî" di peyama xwe de, tevî pîrozkirina vê salrojê ji kadr, pêşmerge û malbatan û hemû malbatên şehîdên Kurdistan û girtiyên siyasî, bas ji sedema girîngîpêdana bi Partiya Demokrat di Rojhilat de kir, û ew yek wekî bihêzbûna hemû tex û çînên civakê binav kir,ku xebata wê ji bo dabînkirina jiyaneke bextewer ji bo hemû civakê, bi bê cudahîdanîn bû.

Herwisa di beşeke din a peyama xwe de, îşare bi xebata 73 saliya Hizba Demokrat kir û got: "Hizba Demokrat bi panahî û kûrahiya hemû Kurdistanê tenê partiyek e ku kariye 73 salan bi bê îxanet xebata xwe berdewam bike".

Herwisa navbirî bas ji xwastên xelkê Kurdistan û xwasta Partiya Demokrat kir û ragehand: Em dixwazin wekî çend milyon kesan bixwe xwe bi rê ve bibin, em dixwazin axa me, ya me bixwe be, wekî milyonan însanên din em dixwazin pêwendiyên civakî yên me li gorî yasa û pirensîpên xwe em bi rê ve bibin, em li ser vê baweriyê ne ku azad bijîn û azadiya take kesî me hebe". Herwisa bas ji xebata nû a Partiya Demokrat "Rasan" kir, û di vê derheqê de jî got : "Partiya Demokrat dîrokê ducarî nake û fire jî nade, belku li ser bingeha dîrokê, dîrokê dinivîse, Rasan jî her li ser vê piroseyê darêtiye, û xebata Çiya û Bajar jî bi hev re girê daye, heta ku hemû çîn û texan bi hev re, û jî nû ve nîştimanê dirust bike".

Daxwaz ji hemû xelkê Kurdistanê kir da ku, di avakirina nîştiman de beşdar bin.

Di dawiya vê rêûresimê de, helbestek li jêr navê "Nasname" ji aliyê helbestvanê pêşmerge bi navê "mamosta Bêbeş Pîrotî" ve hate pêşkêşkirrin.

Piştre "Xulam Fatihî" stranek li jêr navê "Rasan" »»» R:3

## Fermandariya Hêza Pêşmergê Kurdistanê derheq şer û pevçûnên Hêza Pêşmergê Kurdistanê digel hêzên rejîma Îranê li navçeyên çiyayî ên Şinoyê daxuyaniyeke nivîskî weşand.

Deqa daxuyaniyê weha ye:

Daxuyaniya Fermandariya Hêza Pêşmergê Kurdistanê derheq şer û pevçûnên Hêza Pêşmergê kurdistanê digel Hêzên rejîma Îranê li navçeyên çiyayî ên Şinoyê

Di doma kar û çalakiyên Hêza Pêşmergê Kurdistanê li Rojhilat, desteyek ji pêşmergeyên Hêza Pêşmergê Kurdistanê di dema guherîna cihê xwe bo cihekî din, di navçeyên çiyayî ên Kêleşîn a şinoyê, şeva 19 li ser 20`ê Gelawêjê demjimêr 1`ê şevê, piştî vê ku ji aliyê caş û ajanên Spaha Pasdaran ve ciyê wan eşkere dibe, ji sê aliyan ve dikevin kemîna hêzeke zêde ya caş û xwefiroşan û Spaha Pasdaran de, û ji hemû aliyekî ve têne agirbarankirin. Eva di demekê de ye ku hevdem mozelanên (molgehên) rejîmê jî, ji dûr ve, û herweha topxaneyeke din ji hemû aliyekî ve, cihê hatûçûna pêşmergeyan agirban dikin, û şerekî giran û neberamer dest pê dike.

Xortên netirs û cangorî ên Hêza Pêşmergê Kurdistanê, gellek bilez berbirûyê hêza zêde û teyar bi çekên giran ên dijmin dibin. Şer hindî ku diçe germtir dibe, bi awayekî ku piştî bersivdana pêşmergeyan, hêza dijmin ji milekî ve paşve vedikêşe, û qada destvekirina pêşmerge berfirehtir dibe,bi awayekî ku pêşmerge bi ser dijmin de zal dibin, û riya bersivdana zêdetir ji xwe re vedikin.

Ew şer heya nêzî demjimêr 6`ê sibezû dom dike, û xisareke canî ya berçav li dijmin dikeve, û li gora zanyariyan rejîm 12 kuştî û 8 birîndaran dide. Dijmin piştre demildest bo dapoşîn û peçavtina xisarên xwe, bi trombêlên peçavtî û hêlîkopterê, kuştî û birîndaran dibe Urmiyê.




Di vî şerê neberamber û bixwîn de, mixabin çar pêşmergeyên cangorî bi navên: Ebdulselam Ebdî, Silêman Mihemedzade, Ebdulwahid Sohrabî û Îsma`îl Îranmeniş canê xwe gorî dikin, û tevlî karwana şehîdên kurdistanê dibin, ku sê kes ji wan hevalên birîndar, bi sedema kûriya birînên xwe, bi narincokên destî, canê xwe dikin goriyê nîştiman, û du pêşmergeyên leheng û cangorî ên "Bajar" jî, di vî şerî de, bi navên: Usman Rehmanî û Mêhran Tehapûr tevî wan çar hevalên din, tevlî refa karwanê şehîdan dibin, û herweha du pêşmergeyên din jî birîndar bûn. Pêşmergeyên din piştî xatirxwastinê ji şehîdan, sonda emegdariyê bo wan ducarî kirin, û dirêjî dane erkên xwe.

Hê Pêşmergê Kurdistanê ji destpêka "Rasan"ê, û bi taybetî di buhara îsal de, berdewam di navxwe ya Kurdistanê, di nava gund û bajaran de, erk û wezîfeya xwe bi rê ve biriye, û di dema êrîşa dijmin de, di çarçoveya "parastina rewa" de, derbên bibandor li hêzên dijîgelî xistine.
Em xelkê kurdistanê xatircem dikin ku Komara Îslamî wê tawan û baca vê bêpirensîpiya xwe bide, û ew êrîş bêbersiv namîne, herwekî çawa li çiyayê Siyakêw û Bane û Nexede û Pîranşar û Hewrama û …hwd de, selimandin ku ew xortên bicerg û şoreşger, di hundirê Kurdistanê de ne.
Ji aliyê rêberatiya PDKÎ û fermandariya Hêza Pêşmergê Kurdistanê ve, em sersaxiyê dibêjne malbatên serbilind ên van şehîdan, û xwe hevpar û şirîkê xemên wan dizanin, û soz didin ku heta bidestveanîna armancên wan, riya wan bidomînin.

Ruha wan şa be
Fermandariya Hêza Pêşmergê Kurdistanê

»»» **Doma nûçeya manşetê**

pêşkêşî beşdarbûyiyan kir.

Ji aliyekî din ve, peyama hevpar ya Saziyên Yekîtiya Jinan, Ciwanan û Xwendekarên PDKÎ, ji aliyê "Zekiye Sidqî" ve hate xwendin.

Ev rêûresm bi xwendina sirûda bi navê "Pêşmerge tu sengerî" ji aliyê Hêza 129 ve dawî pê hat. Her di vê derheqê de li navxweyî Rojhilata Kurdistanê jî bi awayekî berçav endam û alîgorên PDKÎ bi belavkirina tirakt û posterên tyabet bi vê rojê û nivîsandina diruşmên pêwendîdar rêj ji vê roja dîrokî girtin. di Başûra Kurdistanê jî çend semînar di vê derheqê de bi rê ve çûn. Li dervey welat jî endamên PDKÎ bi lidarxistina merasiman ew roja dîrokî bi bîr anîn.



# Deqa peyama birêz Mistefa Hicrî Lêpirsyarê Giştî ê PDKÎ derheq 25`ê Gelawêjê




**Mistefa Hicrî:**

**Hûn deryayeke bê binî ne, ku şîpelên we, dijmin dibe`ecînin, masiyên çiya hembêz bikin**

**Hevnîştimaniyên me, û Kurdistaniyên xweragir!**

25`ê Gelawêja hemû salekê, tîne bîra me, ku di vê rojê de, tevgera rizgarîxwaza Kurd li Rojhilata Kurdistanê, bûye xwediyê hizbekê ku eva heyama 73 salan e, bêrawestiyan bo Kurd û Kurdistanê xebatê dike.

Hizba Demokrat, ev hizb e ku ji destpêka avakirinê ve weke partiya girûpek yan jî pêkhateyeke destnîşankirî danekete qada xebata Rojhilat. Ev partî tenê milkê endam û alîgirên xwe nine, belkî bûye milkê hemû rojhilatiyan.

Di rewşeke weha de, hewce ye ku em awirekê bidin vê pirsê, ku çima 25`ê Gelawêjê wekî roja avakirina PDKÎ ew qas girîng e? Herwisa ew girîngî ji kuderê ve çavkanî digre?

Berî ku ev partî were avakirin û piştevan û bingeha sereke a Komara Kurdistanê be, encama guhertineke bingehîn di danasîna Kurdbûn û Kurdistanîbûnê de ye.

Ev guhertin jî vedigere bo wê demê ku civaka Kurdî biryarê distîne, ku cuda ji Kurdbûnê, tevlî cîhaneke din bibe."

Eva ku îrorojê wekî tevgereke rizgarîxwaziya kurd nas dikin, tevgerek e, ku paş rûxana deshilata Erdelaniyan, rêbertiya pirsa Kurd bi dest ve digre. Bi gotineke din, paş Erdelaniyan, û vegeşîna bîra bingehdanîna dewlet-netewe ya Îranî, Kurd li Rojhilat biryar daye ku rewta berengarî û berxwedana xwe li form û şêwazeke nû de, organîze bike. Ji niha şûnda Rojhilata kurdistanê dibe kangeh û qada serhildana tevgera Kurdî.

Yekem pêngava serhildana Kurd li Rojhilat, bi yekîtiya bizava Şêx Ubeydullahê Nehrî û hevalbendiya Hemze axayê Mengur dest pê dike. Ew serhildan piştre tê veguhastin bo Simkoyê Şikak. Li encama serhildana Nehrî û Hemze axa û Simko, Kurd li Rojhilata kurdistanê bi berxwedan, û rabûnê adet dike.

Êdî ji niha şûn de, berengariya dagîrker dibe buhayek, lê bona vê ku civakek riya rizgariya xwe bigehîne encamê, tenê bi berengarbûnê nabe, belku hewcehî bi tevger û rêkxistinekê heye, da ku hemû civakê tevlî vê pirsê bike.

Hêzgirtina bîr û deshilata pawanxwaziyê ji aliyê dagîrker ve wisa dike, ku civaka Kurdî bîr ji bizaveke kulturî û siyasî bike, da ku ji vê riyê ve peyv û watayên dagîrkariyê bêwate bike. Di vê rawestgehê de ye, ku "J-K" serî hildide. Girûpek bi hişmendiya tevgerî ve, ku armanca wan bingehdanîn bo berxwedanê bûye, di nava cewher û eqliyeta civakê de. Ya ku "J-K"ê kir, rêkxistina van peyv û wateyan bû, ku Kurd hewcehî pê bû, di rewta cardin bingehdanîna nasnameya xwe de.

Lewra "J-K"ê karî pirsa Kurd li Rojhilat veguhêze qonaxeke din. Hewlên J-K karî ku derseke din bi pirsa Kurdbûnê ve zêde bike. Lê hewcehiyeke bingehîtir di civaka Kurdî de mabû, ku dibû bête cî, ew jî guherîn û cihgirkirina cureyeke din ji rêkxistina di civaka Kurdî de bû. Jiber ku rêkxistinên din, nerîtî (sunetî) bûn, û nedikarîn li gora demê, nûnertiya civakê bikin, û di heman de mê de manîfistkirina pirsa Kurd jî hewcehî bi saziyekê hebû, da ku ji vê riyê ve bibe zimanhal û berdevkê berjewendiyên civaka Kurdî.

Di vir de ye ku PDKÎ ji dayîk dibe, da ku civaka Kurdî û pirsa Kurd bigihîje qonaxeke geşekirî. Bi vê wateyêku ruha berengariyê di civaka Kurdî saz bibû, eqliyeta bûna bi bizavekê serî hildabû, pirsa Kurd ji rekxistina nerîtî derbaz bibû, û di dawiyê de pêgeh û cihek heye ku wekî dengê piraktîk a Kurd dikare rola berdevkî û nûnertiya Kurd bi dest ve bigre.

Bi hatina Hizba Demokrat, pirsa Kurd reng û rûyeke din bi xwe ve digre. Reng û rûyek ku hilgirê rabûn û Rasana civaka Kurdî bûye. Di vê Rasanê de, gotar, stratejî û taktîkên cuda kar li ser hatiye kirin.

Hizba Demokrat jî, ji bo bidestxistina mafên neteweya Kurd ji şêwazên cuda mifah standiye. Lê hin tiştên mayînde li cem vê partiyê hene ku ti caran nayên guhertin û ew jî, maf, nasname, xak, welat, wekhevî û kerameta Kurd û Kurdistaniyan e."

Di van salên dawiyê de, gotar û stratejiyeke nû ji aliyê PDKÎ ve hate ragehandin, ku bi Rasana Rojhilat hatiye naskirin. Rasanek ku çavkaniyê digre ji mîrata Kurdbûn li Rojhilat û guherînkariyên civaka Kurdî.

Di Rasana vê serdemê de, çiya û bajar du kokên serekî ne, ku nûnertiya derbazbûyî û niha dikin. Derbazbûyî wekî mîratekê ji rabûnê, ew mîratê ku ji şoreşên pêş Komarê ve dest pê kiriye, û gihîştiye qehremanên Qereseqel û Kosalanê, û heya niha jî her dom heye. Di heman demê de mîratek ku bizavek bi navê "J-K" afirandiye, û bûye hêvinê xebatekê bi navê xebata bajar. Ew xebata ku newroza camaneyan (axabaniyan, cemedaniyan), hemaseya Kirmaşanê, şahiya alayan, û pêşwaziya germ ya xelkê ji pêşmergeyan, nûnertiay wê dike.

Hicrî di derbarê "Rasan"a Rojhilat de jî da xuyakirin ku: "Di "Rasan"a Rojhilat de, PDKÎ di ser dîrokê re derbas nabe, belkî dîrok û niha, weke tewawkerê hev dibîne. Ji ber ku felsefeya hebûna PDKÎ, tewawkarî ye. Wateya vê jî ev e ku bi hatina PDKÎ, xebata rizgarîxwazî a Kurdan karî derbasî serdemeke modern bibe û "Rasan"ê jî weke serdemek dibîne, ku me derbasî qonaxeke din bike."

Bi heman awayî jî Rasana Rojhilat wekî serdemekê dibîne, bona derbazbûna bo qonaxeke din. Qonaxek ku Îraniyan jî zendê xwe jê re hildane.

Guherînkarî jî di vê meha dawiyê de, di Îranê de zêde bûne, û wisa xuya dike ku paş çar dehikan ji deshilatdariya Komara Îslamî, ew sîstem ji hemû aliyan ve rastî

şikest hatiye. Bingehên serekî yên gotarên saxte û tezwîr ên rejîma Îranê, li cem xelkê êdî nahêne guhdarîkirin. Di heman demê de, kêşeyên aborî, civakî û kulturî pêsîra hemû beşên Komara Îslamî girtine.

Bi awayekî ku kesên herî nêzîk ên rejîmê jî, rewşê wekî metirsiyeke mezin li ser Komara Îslamî dizanin. Mînaka herî berçav ya wan jî, Xatemî serkomarê pêşîn e, ku daxwaza yekgirtin û pêkvesazanê dikir, bona vê ku pêşiya herifîna Komara Îslamî bigre. Eva ku li ser şeqamên Îrana îrorojê de heye, nabe tenê di pirsa aborî de bihê kurtkirin, belku pirs û daxwaza sereke ya xelkê siyasî ye, ew yek jî di diruşman de ku rasterast Wilayeta Feqîh dikin armanc, xwe nîşan dide.

Ya ku ji hemiyan re eyan e, ew e ku Îran nikare wekî Îrana pêşîn be, û dibe Îraneke din bê avakirin. Îranek ku wehma dîrokî, îdolojiya ayînî û neayînî, deshilatdariya taqm, girûp, û neteweyeke diyarîkirî dawî pê bê. Heman stratejî ku PDKÎ xebatê jê re dike. Bo PDKÎ tenê Îranekê dikare wata hebe, ku Îraneke din be, ne dubarekirina ya ku hebûye, û ya ku dixwazin. Ew yek jî nagihîje encamê, hekî diyalog û stratejiya hevpar li ser bingeha mafên neteweyên bindest, û garantîkirina ewlehiya nasnameya neteweyî ya wan pêk nehê.

**Xelkê xweragir û xebatkar ê Kurdistanê!**

PDKÎ serbilind e bi vê ku her ji rojên destpêka damezirandina xwe ve heya niha, ku 73 sal bi ser temenê wê re derbaz dibin, bo nasnameya neteweyî û demokrasî û azadiyê xebat kiriye, û di pêxemê de qurbanî daye, ew armancên ku serdemekê ji aliyê hinek aliyên fikrî ve, wekî paşvemayî û hizra tayifegeriyê dihatin dîtin, lê niha gellek ji wan aliyan, bi salan e ku ba dane, û xwe wekî alahilgirê van hizr û buhayan dihesibînin, ku PDKÎ li ser hatiye avakirin, eva jî ew rastiya ye, ku ew hizba me gellek zêdetir ji wan, ji hewcehiyên xelkê Kurdistanê têgihîştiye, hewcehiyek ku xwe li serveyî xak û netewe de dibîne, ku hertim armanca dijmin bûye, bona vê ku van bihayên bilind kêmbuha bike, û xaka wê dagir bike, û bîra neteweyî li xwe de bihelîne, û ji vê biyavê ve, ji tu cinayetekê destê xwe neparastiye.

Lê di hemberî Komara Îslamî û ên ku pêş wê jî , di vê pîlana xwe de serkevtî nebûn, û Kurdê Rojhilat bi palpiştiya PDKÎ gellek hişyarane berbûne canê dijmin, û ne tenê her di nava gelê serdest û şovenîzma Îranî de neheliyan, belku hizra neteweyî, mafxwazî, û azadiya nîştimana wan, li jêr serkut û pîlanên zêdetir de xemiliye, û hêz wergirtiye, û niha jî ji her demî çalaktir, bi palpiştiya hizba xwe bo gihîştina bi armancên xwe xebatê dike.

Sê salan berî niha li quntara çiyayê bilind û befrîn ên Kurdistanê, peyama newroza Rasanê, me gehande guhên xelk têhniyê azadiyê li Rojhilat, û me mizgîniya xebateke nû ya rabûnê da, û lawên kurdistanê jî ew peyam bi dil û can wergirtin, û deste-deste rû kirin binkeyên PDKÎ, û kincê pîroz ê pêşmergatiyê li xwe kirin, û bûne çiya bo piştevaniya bajar, û bajar jî himbêza xwe bo wan vekir, û ew li himbêza xwe ya pirr ji coş a Rasanê de vehewandin, niha êdî çiya û bajar, hevdu hembêz kirine, û bûne hêzeke wisa ku zirava dijmin qetandine. Niha çiya û bajar bibawer in ku nîştimaneke din ava bikin, û dîrokê ser ji nû binivîsin.

Bajarên min ên xweştivî, û bê miraz ên Kurdistana min, hûn deryayeke bê binî ne, ku şîpelên we, dujmin dibe`ecînin, û serkeftin jî dibe para we. Masiyên çiya hembêz bikin. Ew di nav şîpelên we de ne, lewre divê hûn hêzê bidin wan û hêzê ji wan bistînin. Bila şîpelên we hertim biherikin, hêviya we bilind bin û neyên têkbirin.

Dem hatiye ku êdî tif û le`inetê bikin li nanê serşoriyê, û vegerin hembêza gel û nîştiman. Êdî xulametiya dujmin bes e. Tu emeg û wefaya vê rejîmê ji bo bawermend û hevalên xwe jî nîne. Pêşerojeke geş bidin fikra xwe, ku di vê pêşerojê de, temenê reş ê vê rejîmê bi dawî tê, û hûn dimînin bi vî xelkî re, ku hûn bûne sedema bêrêziya rejîmê bi wan, û malên wan hatine dagirkirin û talankirin, û xweştiviyên wan hatine kuştin yan girtin. Êdî dem hatiye ku karekî encam bidin da ku di wan rojan de bikarin li çavên vî xelkê tepisandî binêrin, û bi wan re bijîn. Lewre divê vê derfetê ji dest nedin.

Bila em hemû pêkve Kurdistanê bikin nîştimana azadî û demokrasiyê, û bila nivşa pêşerojê, dûr bin ji van hemû kêşeyên derûnî û bêpariyê, û hûn û ew jî hêjayî jiyaneke serbilindane ya serdema xwe ne.

Di dawiyê de silavan dişînim bo riha pak ya hemû şehîdên 73 sal xebata PDKÎ.

25`ê Gelawêjê salvegera avakirina PDKÎ li hemû malbatên şehîdên serbilind ên hizbê, kadr û pêşmerge û hemû xelkê Kurdistanê pîroz dikim.

Pîroz be li pêşmergeyên bajar, û hemû azadîxwaz û welatparêzên welatê min.

## Peyama hevxemiyê a lêpirsyarê giştî ê PDKÎ ji bo koça dawiyê a kek Se`îd Kiwêstanî



**Lêpirsyarê giştî ê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta koça dawiyê a kek Se`îd Kiwêstanî peyameke hevxemiyê belav kir.**

Peyam wiha ye:

Ez bi bihîstina nûçeya koça dawiyê a kek Se`îd Kiwêstanî xembar bûm. Piştî destpêkirina xebata nû a Rojhilatê Kurdistanê, ez hertim nûçeyên şehîdbûna serbilindane a pêşmergeyên xweştivî û wêrek ên partiya me di şerên qehremanane de dibîsim, ku ji bo azadiya gelê me şer dikin, û ew nûçe bi êş in û min xembar dikin.

Lêbelê koça dawiyê a hevalekî kevnar ê rêbaza Demokrat weke kek Se`îd, ji bo min êş û azarên xwe hene. Min kek Se`îd li bajarê Nexedê nas kir.

Wê demê, wî di dukana xwe a biçûk a wênegiriyê de kar dikir. Ew mirovekî gellek aram û bêdeng bû, û her kesê ku ew nas nekira, nedizanî di bin vê aramiya wî de şîpelek ji hesta niştîmanperweriyê ji bo azadiya neteweya wî heye. Tevahiya gotinên wî ji vê hestê îlham digirtin, û bandor dikirin ser xelkê.

Behsa îşkenceya di girtîgehên rejîma Pehlewî de, êş û elemên di koçberiyê de ên ku ji ber xebatkirin di refên PDKÎ de kişandibûn, tevî ku destkurt jî bû, bi hêvîbûn û wêrekiya wî, hemû hêja ne ji bo ku mirov waneyan ji wan fêr be.

Ew wêrekî û hêviyên di dilê wî de bûne sedem ku heya piştî bidawîhatina desthilatdariya Pehlewî jî, di xebata xwe a rêbaza Demokrat de berdewam be, û di encamê de careke din neçar bû dûriya welat bibîne û ji axa xwe koçber be.

Lê dîsa jî di dema girtîgehê de, bi hemû dijwariyên jiyanê re, bi bûyerên cuda ên jiyana wî û PDKÎ, lê tenê carekê jî guman li cem wî çê nebû, û ji rêbaza partiya xwe derneket. Jidestdana van hevçeperan pirr dijwar û giran e, lê ev nirxa azadiyê ye ku em didin.

Ez bi hilkefta koça dawiyê a vî heval û hevxebatê me, sersaxiyê didim malbat û hevalên wî, û hêvî dikim armanca kek Se`îd û bi hezaran xortên Kurd ku ji bo azadiyê jiyana xwe kirine qurbanî, bigîjin encamê.

Ruhê wî şad be.

# Rûxana rejîmê dest pê kiriye

**H: Faysal DAĞLI**

IMPNews - Lêpirsyarê Giştî yê Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê (PDK-Î) Mistefa Hîcrî rewşa dawîn ya Îranê, Rojhilatê Kurdistanê û hewldan û xebatên nav welat û hevkariya nav partiyên kurd yên Rojhilat ji bo İMPNews'ê nirixand.

Hîcrî di derbarê ambargoya Amerîkayê ya ser Îranê de balê dikşîne ku ev yek derbek e giran e ku li aboriya lawaz ya Îranê û encama van dorpêçan dibe sedema zêdetirbûna asta bêkariya xelkê, giranî û jidestdana Tûmenê Îranê." Li gor Hîcrî, ew rewş dibe sedema nerazîbûna zêdetir ya xelkê Îranê û piroseya rûxana rejîmê dest pê kiriye.

Hîcrî dibêje; "di dawiya vê piroseyê de ku herifîna rejîmê ye, girêdayî ye bi hatina ser kar ya rêberiyeke cihê baweriyê, ku bikare nerazîbûna organîze bike, karibe bibe altirnatîv bo Îranê û derve" û didomîne; "mixabin heta niha alternatîveke bi vî rengî pêk nehatiye."

Hîcrî derbarê mudaxelaya rejima Îranê ya ser Suriyê de balê dikşîne ku Îran dixwaze li Sûriyê xwe bihêz bike û bikaribe li dijî Îsraîlê pîlanên xwe bi kar bîne. Lêpirsyarê Giştî yê PDK-Î dibêje; Îran dixwaze bê astengî bi riya bejahî ve, ji Tehranê bigîje Sûriyê û Hizbullaha Lubnanê. Li gor Hîcrî, Tahran hewldide ku Kurdên Rojava nikaribin li ser xaka xwe bibin xwedî deshilat, ji bo vê jî bandoreke zor li ser hikûmeta Sûriyê dike. Hîcrî derbarê çalakiyên partiya xwe ya li Rojhilat jî balê dikşîne ku di sê salan dawîn de Pêşmergeyên wan di nava xelkê de amade bûne û her niha jî gelek Pêşmergeyên bajaran bi kar û tekoşîna di nav welat de mijûl in.

Lêpirsyarê Giştî yê PDK-Î, li barê hewkariya hêzên Rojhilat de dibêje, wan gelek hewl dane, da ku di navbera hizbên Rojhilat de navendeke hevkariyê pêk bînin û niha pêwendiyên wan baş e. Ji bo yekkirina hêzên Pêşmerge jî hewlên wan berdewam de. Hîcrî dibêje bi PJAK'ê re ti pêwendiyan wan nîn in.

Lêpirsyarê Giştî yê PDK-Î Mistefa Hîcrî pirsên IMPNews'ê bersivandin.

**-Pirs: Piştî hatina Trump, têkiliyên Washington û Tehranê careke din xera bûn, niha herdû alî li hevûdu gefan dixwin. Îran demeke di nav qeyraneke mezin ya siyasî û aborî de ye. Civak ne murteh e, li gelek deveran protesto hene. Ji layê we wêneya Îranê çawa tê dîtin, dema hûn li Îranê temaşe dikin çi dibînin? Bandora zextên Amerîka li ser rejima Îranê wê çi tesîrî bike? Eger aboriya Îranê xirabtir bibe, mumkin e ku gel bi giştî ser hilde li dijî rejîmê û rejim birûxe?**

**Bersiv:** Me jêve ye ku kirîza aborî, civakî û siyasî ya Îranê ku encama nêzîk bi 40 salan deshilatdariya hikûmeta Îslamî ye, gihîştiye astekê ku rejîm ne tenê her nikare çareser bike, belku roj bi rojê asta kirîzan zêde dibe. Sedema vê rewşê jî vedigere ser îdeolojiya paşvemayî ya vê rejîmê ku siyaset, aborî û pirsên civakî di çarçoveya vê îdeolojiyê de dibîne, îdeolojiyek ku tu çareseriya wê ji bo kirîzên wê serdemê tune ye û bi xwe kirîzafir e. Ew dorpêçên Amerîkayê jî ku di meha Novamberê de, vedigerin ser neft û gaz û …hwd, dibin sedema vê ku kompaniyayên mezin û girîng pirojeyên xwe ji Îranê vekişînin, bona vê ku nekevin ber dorpêçên Amerîkayê. Di encama van dorpêçan de, bankên xwedîhitbar û mezin ên Amerîkayê û Ewropayê jî danûstandinê digel Îranê nakin û ew yek jî dibe sedema vê ku Îran di warê transîta Dolarê ve paş bimîne, ji bilî vê yekê Amerîkayê ragehandiye ku şandina nefta Îranê ku niha di rojê de, nêzî 2.4 milyon bermîl e bigehîne sifrê.

Ew yek jî derbeke giran dibe ku li vê aboriya lawaz ya Îranê dikeve. Encama van dorpêçan dibe sedema jêhelçûna rojbiroj zêdetir ya asta bêkariya xelkê, giranî, jidestdana Tûmenê Îranê, ku her di heyama şeş mehên borî de, zêdetir ji %50 bûhaya xwe li hemberî Dolar de ji dest daye. Ew rewşa dibe sedema nerazîbûna zêdetir ya xelkê Îranê û piroseya rûxana rejîmê dest pê dike. Xala dawiyê ya vê piroseyê jî ku herifîna rejîmê ye, girêdayî ye bi hatina ser kar ya rêberiyeke cihê baweriyê, ku bikare nerazîbûna organîze bike, ji aliyekî din ve bikare bibe alternatîveke cihê baweriyê bo navxwe ya Îranê û derve, ku mixabin heta niha alternatîveke bi vî rengî pêk nehatiye.




**-Pirs: Niha bi giştî li nav welat rewşa rejimê çawa ye? Du salên dawîn de li Kurdistanê jî gelek protesto û çalakî hatin lidarxistin. Herwiha çavê hemû kurdan jî li Rojhilat e. Li gel ew çend zilm, sêdaredan, kuştin û zextên rejimê, kurdên Îranê wek beşên din ne çalak in. Ev dîtin rast e? Hege rast be, çima siyaseta Rojhilat têra xwe ne çalak e?**

**Bersiv:** Kurd di Rojhilata Kurdistanê her di destpêkê de li jêr zextê de bûye û hatiye piştguhxistin. Xwendin bi zimanê Kurdî di xwendingehan de qedexe bûye û kultur û dîroka Kurd bi awayekî pilandarêjkirî berevajî hatiye nivîsandin û nîşandan û asîmîlasyona Kurd gellek bi tundî berdewam dike. Hejmareke zaf ji çalakên siyasî ên Kurd hatine îdamkirin, yan jî niha di girtîgehan de ne, lê bi vî halî jî Kurd di Îranê de qet neketiye qedeman û berdewam bona bidestxistina azadiya xwe xebat kiriye. Niha jî Kurdên Rojhilat li ser xebata li dijî rejîma Îranê gellek çalak e. Ew şêweya xebatê jî gellek bi awayê veşartî û nepenî bi rê ve diçe, heta ku eşkere. Jiber ku rejîma Îranê ji vê şêweya xebatê gellek ditirse û gellek bi tundî serkut dike.

**-Pirs: Rejima Îranê li Sûriye li pey çiye? Çi tesîrek Tahranê li ser siyaseta rejima Şamê ya dijî Kurdên Rojava heye?**

**Bersiv:** Rejîma Îranê dixwaze ku li Sûriyê de xwe bihêz bike û bimîne bona vê ku bikare li dijî Îsraîlê pîlanên xwe bi kar bîne, ji aliyekî din ve jî alîkariyên xwe bi bê astengî ji riya bejahî ve, ji Tehranê bigehîne Sûriyê û li wir jî bigehîne destê Hizbullaha Lubnanê. Ji bilî vê yekê bikare rasterast bandorê danê, ku Kurdên Rojava nekarin li ser xaka xwe bibin xwedî deshilat, eva jî bi sedema bandoreke zor ya Îranê ye li ser hikûmeta Sûriyê, ku alîkariyeke zaf ya hikûmeta Beşar Esed kirin, bona vê ku di deshilatê de bimîne.

**-Partiya we ji salên 1990'an heta du sal berê got; 'Ji bo li ser Başûrê Kurdistanê zextan neke hûn dest ji xebatên leşkerî berdidin.' Kurdên Rojhilat li nav welat demên dirêj bê serokatiya siyasî ma. Niha jî zextên rejima Tahranê (wek mînak di dagirkirina Kerkûkê de hêzên îranê rola sereke lîstin) li ser Hewlêrê didome. Aya hesasiyetên we guherîn an jî konjonkturêk din derket meydanê, wê helwesta xwe guhert?**

**Bersiv:** Rast e ku partiya me bi salan bû ku li ber parastina Hikûmeta Herêma Kurdistanê li hemberî pîlanên rejîma Îranê xebata çekdarî ragirtibû, herçend ku rêkxistina xelkê û endam û alîgirên PDK-Î berdewam bû, lê di sala 2016`an de ku me pêşbîniya guherînkariyan di Îranê de kir û ji me re eşkere bû ku rejîma Îranê ber bi qeyran û arîşeyên mezin ve diçe, me xelkê xwe di Rojhilata Kurdistanê organize kir û bona vê ku xebata çekdarî jî heke hewce bike, bi rê ve bibe, bo piştevaniya ji xebata cemawerî û medenî li bajaran. Di van sê salan de Pêşmergeyên me di nava xelkê de amade bûne û her niha jî hejmareke zaf ji Pêşmergeyên bajar mijûl in kar û tekoşîna xwe di nav welat de bi rê ve dibin.

**-Pirs: Partiya we çi pilan daniye ji bo Rojhilat, xebatên we niha bi çi şêweyî didomin li nav welat**

»»» R:8

## Nerîna Lîderan



Trump:

"Eva bû demeke dirêj, Tirkiye bûye pirsgirêk û weke dost tev negeriyaye".



Xamineyî:

"Ezê danûstandinên bi Amerîkayê re qedexe bikim".



Rodrigo Dutêrtiz:

"CIA axavtinên min guhdarî dike û renge min bikuje".



Salih Mutleg: :

"Ebadî, Malîkî û Amirî ji bo serokwezîriyê nabinn".

# Peyamên hevxemiyê ên xelkê Kurdistanê derheq şehîdbûna desteyek ji pêşmergeyên PDKÎ

**Endam û alîgir û xelkê dilsoz yê Hizba Demokrat bi boneya şehîdbûna desteyek ji pêşmergeyên Kurdistanê, di şerê li dijî dagîrkaran de, hevxemî û sersaxiya xwe ji Partiya Demokrat û malbatên serbilind yên şehîdan re gotin.**

Endamên Partiya Demokrat li bajarê Bokanê, devera Jawero a Merîwanê, gundê Gergul, devera Leylaxî a Sine bi boneya şehîdbûna desteyek ji pêşmergeyên Partiya Demokrat, sersaxî ji Partiya Demokrat re gotin, û peyman digel rêbaza şehîdên Kurdistanê nû kirin.

Deqa peyamê wiha ye:

Bokan

Em endamên PDKÎ li bajarê Bokanê bi boneya şehîdbûna 4 pêşmergeyên Çiya û 2 Pêşmergeyên Bajar li devera Şinoyê, sersaxiyê didin rêberiya Partiya me, kadr, pêşmergeyên hizbê li Bajar û Çiya û herwisa sersaxiyê dibêjne malbatên serbilind yên şehîdên Kurdistanê, û peymana emegnasiyê digel xwîna şehîdên nû yên xwe nû dikin, ku heyanî serkevtinê emegdarê rêbaza wan dimînin.

Jawero a Sine

Silav li rêbaza şehîdên serkirde Qazî, Qasimlo û Şerefkendî û hemû şehîdên riya azadiya Kurdistanê bi taybet şehîdên nû yên Rasanê. Mixabin li bajarê Şinoyê qelaya xweragirî û berxwedanê, 6 Bazên Demokrat, 6 ciwanên bicerg yên Kurdistanê, 6 kotrên spî û 6 firişteyên azadiyê di şerekî ne berambar û qehremanane de, digel kirêgirtî û qirêjxwar û sîxorên rejîma îdamê li bajarê Şinoya serbilind, tevlî karvana tijî ji şanazî a şehîdên sorxelat yên Kurdistanê bûn, û bi xwîna geş a xwe dara azadiyê av dan, û riya serkevtina wan ji bo ciwanên Kurdistan rohn kirin. Ev nûçeya gellek nexweş bû, lê em dersxwenên Pêşewayê qet nemir, li mekteba Dr. Qasimlo bi başî hînî vê yekê bûne, ku ji bo şehîdbûna hevalên xwe negirîn, belku ji dijminên dagîrkar re diselimînin ku em nakevin qedeman, û Kurdistanê dikin goristana agir ji bo canê dagîrkaran.

Renge karwana şehîdên me dirêjtir be, lê emê rê û armancên wan bidomînin, heya serkevtina yekcarî a neteweya me, û bi xatircemî ve dibêjin ku: Tolstdandin bi sebr e, lê bi zebr e.




Em xelkê Jawero a girêdayî bajarê Sewlava û gundên derdorê wekî "Ewîheng, Hûye, Serhûyê, Salyan, Nicê û Bîsaran û gundên din, li devera şehîdên wekî şehîd "Mensûr Reşe hewramî" û şehîd "Es`ed Muqedesî" sersaxiyê didin hemû endam û alîgir û malbata mezin a Demokrat û bi taybet malbatên serbilind yên van şehîdan, û digel rêzbaza bilind ya wan soz didin, heta-heta dirêjîderên riya wan dibin, û nakevin qedeman, heyanî serkevtina armancên Kurdistana dagîrkirî".

Careke din rêrewa karvana şehîdan bi şehîdbûna desteyek ji şengesiwarên qada xebat û têkoşîna azadî û berevanîkirin ji axa pîroz a nîştiman kete rê û dom heye; Bêguman karvana şehîdên me dûr û dirêj e, renge ji vê jî dirêjtir be, lê girîng ew e ku ciwanên têkoşer yên Kurdistanê bi bê tirs ji mirinê riya tijî ji serbilindî a vê karvanê didomînin. Bîranîna van bixêr be, û riya wan tijî ji rêvîng be, şehîdên sorxelat yên gel

Devera Leylax

Ji ber şehîdbûna vê desteya qehremanan em sersaxiyê dibêjin malbatên serbilind yên şehîdan; Kadr û pêşmergeyan û rêbertiya hizbê û hemû xelkê Kurdistanê, û şirîkê vê xema wan in, û peymanê nû dikin ku dirêjîderên rasteqîne yên karvana şehîdan dibin heyanî gihîştin bi armancên wan.
Rêkxistina (Teşkîlat) Veşartî a devera Leylax

Nexede:

Şehîd Dr. Qasimlo: Neteweyek ku azadiyê bixwaze dibe nirxa vê azadiyê jî bide.
Ev şehîdan, namire nav û nîşana ve
Mixabin nûçeya şehîdbûna desteyek ji pêşmergeyên qehreman yên Kurdistanê, dilê Rojhilat dihejîne.

Ev desteya şehîdan wekî hemû şehîdên din yên Kurd û Kurdistanê canê xwe goriyê gel û nîştiman kirin û tevlî karvana sorxelat a şehîdên Kurdsitanê bûn. Her li wir soz û qewl didin heyanî axirîn dilopa xwîna xwe û heyanî dilopek xwînê li cendekê me de be, em dirêjîderên riya we dibin, û çeperên we vala nakin û heyanî gihîştin bi armancên we dev ji xebatê bernadin.
Em soz didin dayîkên şehîdan ku bi şehîdbûna ciwanên leheng yên wan, bi hezaran ciwanên din ji dayîk dibin. Em sersaxiyê dibêjne rêberê hizba xwe yê rêzdar û têkoşer "Mistefa Hicrî", pêşmergên qehreman, hevçeperên şehîdan û malbatên serbilind yên şehîdên Kurdsitanê. Dubare soz didin bi xwîna paqij a şehîdên Kurdistanê ku heyanî gihîştin bi armancên wan dest ji têkoşînê bernadin.

**Riha van şad û riya van tijî ji rêbwar be**
**Bijî PDKÎ, Bijî Kurdistan, Serbikeve Rasan**
**Biherife rejîma Komara Îslamî a Îranê**

»»» Doma R: 6

de?

**Bersiv:** Em kar dikin bona pêkanîna Îraneke demokratîk û federal piştî herifîna rejîma Komara Îslamî, di vê Îranê de hemû neteweyên wekî; Kurd, Tirkên Azerbaycanê, Ereb, Belûç û Turkemen, hikûmeta xwe ya xwecihî hebin, ku birêveberên van hikûmetan bi dengê azad ê xelkê xwe bêne hilbijartin û Kurd û neteweyên din wekî hevwelatiyê pile du nehêne dîtin û nehêne piştguhxistin û xwendin bi zimanê dayîkê be.

**-Li Rojhilatê Kurdistanê niha di warê siyasî û leşkerî de çi diqewime? Çendin car in di navbera hêzên we û hêzên rejîmê de şer qewimî, we sala borî dema ku we Peşmerge şandin Kurdistanê gotibû ku hûnê 'êrîş nekin, tenê xwe biparêzin.' Ev şer çima diqewimin?**

**Bersiv:** Rast e di sê salên borî de, çendîn şer û pevçûn di navbera hêzên Pêşmerge û hêzên rejîma Îranê rû dane, sedem ew e ku rejîmê nedikarî tab û tehemul bike, ku Pêşmerge bi çek ve di navxwe ya welat de û di nav xelkê de amade be, lewra êrîş dikin ser Pêşmerge. Heke ew yek nebe, em dixwazin ku Pêşmergeyên me di nava xelkê de karê rêkxistinê bikin û piştevanê xebata cemawerî ya wan bin.

**-Pirs: Hevdîtinên di navbera partiyên Rojhilat di çi astî de ne. Du sal in, di nava PDK-Î - HDK û Komeleyan de hewlên yekgirtina hêzên leşkerî hebûn, di vê babetê de çi pêşveçûnek heye?**

**Bersiv:** Me hewleke zaf da, da ku di navbera hizbên opozisyona Kurdî ya Rojhilat navendeke hevkariyê pêk hat û niha pêwendiyên me bi hev re gellek baş e û karê hevpar jî me bi hev re heye, lê ew hevkarî carê negihîştine vê astê, ku hêzên Pêşmerge yek bigrin, lê hewlên me bo vê armancê jî berdewam dibin û hêvîdar im ku em di vî warî de jî ber bi pêş ve herin.

**-Pirs: Têkiliyên we bi PJAK'ê re di çi astî de ne? Hûn amade ne li dijî rejimê hevkarî bikin bi PJAK'ê re?**

**Bersiv:** Digel PJAK`ê tu pêwendiyeke wisa me nine.

**-Pirs: Tehranê siyaseta Kurd û hemû dijberên xwe wek casûsên Amerîka binav dike. Amerîka an jî Siûdî an jî welatên din, yên dijberên Îranê ji bo hûn li dijî rejimê şer bikin, bi we re têkilî danîne? Hun wek hêzên Rojhilat ji hevkariyên navnetewî re amade ne?**

**Bersiv:** Em di rewşekê de ku di berjewendiya xebata Kurd de be, me amadeyî heye bo wergirtina piştevaniya navneteweyî bi armanca pêşvebirina xebata neteweyî li dijî rejîma Îranê. Em wekî PDK-Î digel Amerîkayê jî me pêwendî heye, lê heta niha tu dewleteké alîkariya me nekiriye.

**-Pirs: Di navbera Kurdan û muxalîfên rejima Îranê de, çi têkilî an jî hevkariyek heye gelo?**

**Bersiv:** Di navbera hêzên opozisyona Kurd û hejmarek ji hizbên dijberî Komara Îslamî pêwendî û hevkarîkirin pêk hatiye û niha em hewl didin ku vê pêwendîkirinê berfirehtir bikin.

---

»»» Doma nûçeya Navenda Hevkariyê ya R: 1

hizra kevneperestî û di hin destên hin meleyan û faşîzma mezhebî de rewşa jiyana xelkê û derbasiya wan xirabtir dibû. Jin dihatin kevirbarankirin û çarşewên reş didan serên wan, girûpên Hizbullahiyan azadî ji xelkê zewt kirin, dengên nerazî fetisandin, mafên kêmîneyên olî dihatin binpêkirin û mal û milkên wan dihatin şewitandin û talankirin, cudabîr dihatin bêdengkirin, pênûsên jêhatî û serbixwe dihatin şikandin û rojname û kovar û belavok dihatin girtin.

Di wê heyama kurt de piştî serketina şoreşê, xelkê Kurdistanê qonaxeke nû a jiyana azad û bihevrejiyana demokratîk ceriband. Civatên gund û bajaran û sendîkayên pîşeyî hatin avakirin, û xelkê bi rengekî azadane rêveberiya xwe dikir.

Aliyên siyasî bi awayekî azad piropagenda ji bo fikr û ramanên xwe dikirin û vekirîbûneke siyasî a rastîn çê bibû.

Rêz ji hizrên cuda û baweriyên olî dihat girtin û jinan jî weke nîva hêza civakê di meydanê de geşe dikir. Çapemenî û belavokan bi rengekî azad, fikrên cuda ên nava civakê belav dikirin, û sazî û yekîtiyên curbicur ên taybet bi pêkhateyên cuda ên civakê hebûn û berfirehtir jî dibûn.

Gellek nekêşa ku ji bo karbidestên rejîma kevneperest eşkere bû ku tenê riya dasepandina deshilatê bi ser welat de, dijayetîkirina Kurd û Kurdistanê û jinavbirina vê ezmûna sawa û di heman demê de serkevtî ya Kurdistanê bû. Li cem wan serkutkirina Kurdistana azad girtina dawî çepera azadiyê di Îranê de bû.

Di rastî de sedema serekî ya vê êrîşê, ne tenê ew îdia û çewtekariyên pûç û bêwate bûn ku dihatin kirin. Belku hebûna Kurdistaneke azad û demokrat û sekolar bû ku bo deshilata pawanxwaz ya navendî nedihate qebûlkirin. Her bi vê sedemê jî li navendê û rast ji aliyê nûnerên bîrokeya reş ya mesebî ve ferman dihate derkirin, bona vê ku hemû hêzên serkutkar ên rejîmê li hemû cihên Îranê ve ber bi Kurdistanê bêne şandin. Lê cemawerê xweragir ê gelê Kurd û hizbên Kurdistanî ku çend mehan pêştir bi awayê demokratîk û medenî bi beşdarînekirin di bi nav referandoma! Xakelêweya sala 1358-an de "Na" gotibûne vê rejîmê, biryar dan ku bona parêzvanî ji wan deskewt û buhayên ku dest wan ketibûn, di çarçoveya parastina rewa de bi hemû hêz û şiyana xwe li hemberî êrîşa hêz û leşkerê serkutkar de bisekinin û bo carek din "Na"yeke din bêjin vê sîstema dijîgelî.

Di encama vê xebata parastina rewa de li hemberî êrîşa rejîmê li ser Kurdistanê ku di edebiyata siyasî ya Kurdistanê de wekî bergiriya xelkê Kurdistanê li şerê "sê heyve" de hatiye naskirin, rejîm neçar bi gotûbêjê û guhdarîkirina li axavtinên nûnerên xelkê Kurdistanê hate kirin.

Bi vî rengî bû ku Kurdistanê bi berxwedaneke bêhempa û gorîkirina sedan û hezaran xortên têkoşer û xebatkar, xwe wekî yekem çepera berbirûbûnê di hemberî Komara Îslamî de nîşan da û hey niha jî de gel de be, xelkê Kurdistanê û tevgera mafxwazane ya wê dijberên herî micid û bibawer ên Komara Îslamî ne. Niha ku 39 sal bi ser ragehandina fermana cîhada Xomêynî li dijî xelkê Kurdstanê re derbaz dibe, em di serûbendekê de rêzê ji berxwedana dîrokî ya xelkê xwe digrin, ku piraniya nêzîk bi tewaw ya cihên cur bi cur ên Îranê li hemberî siyasetên vê rejîmê de, her yek ji wna bûne Kurdistanek, û xelkê piraniya bajarên Îranê li dijî vê deshilatê hevhelwestê xelkê Kurdistanê ne, û daxwaza guherîna kûr û bingehîn di sîstema siyasî ya vî welatî de dikin.


Piştî nêzîk bi 40 salan deshilatdariya vê rejîmê bi ser xelkê Îran û Kurdistanê de, heya niha jî nav û naveroka Komara Îslamî ya Îranê afirîner û bîrhînerê teror, merg, girtîgeh, serkut, û ber bi paşve vegeriyanê ye. Berhemên vê sîstemê bo xelkê di çar dehikan de, beşa herî zêde pêk tê ji: Hejarî, birçîbûn, gendelî, bêkarî, zêdebûna bikaranîna madeyên hişbir, kêmavî, telaq, xwekuştin û dehan diyardeyên din ên siyasî, aborî, û civakî.

Serhildan û nerazîbûnên tenê yek sala borî ya xelkê Îranê vê rastiyê diselimîne ku xelk bi tewahî ji vê rejîmê bêzar in, û xwazyarê vêdeçûna vê rejîmê û bidawîhatina wê ne. Li ser van şêweyên deshilatan, berê jî dîrokê biryara xwe daye, çi deshilateke dîktator û dijîgelî nekariye û nikare heta dawiyê li hemberî îradeya xelkê xwe de bisekine. Komara Îslamî jî dervey vê qayidê nine. Serwerî ji bo wan dimîne ên ku li hember de sekinîn, û heza azadî û serbestî û kerameta mirov ew pal dan, bo siberojeke geş, ku tê de deshilateke demokratîk garantiya mafê me hemiyan be.

Niha ku Komara kevneperest ya teror û sêdarê berbirûyê dehan kirîzên navxweyî, navçeyî, û cîhanî bûye, û civatên xelkê bibawertir ji hertim li hemberî vê rejîmê de sekinîne, em hêzên siyasî ên Rojhilata Kurdistanê dest di nav destên hevdu de, bi armanca gihîştina bi civakek azad û demokratîk bi îradeyeke girantir ve ber bi pêşerojeke geş me hev girtiye, û em xwe birêkxistin dikin da ku pêngavên xwe bihêztir ji caran ber bi pêş ve bavêjin.

**Navenda Hevkariyê ya Hizbên Kurdistana Îranê**
**28.05.1397**

# Rewşa aboriya Kurdistanê



**Dawî rewşa bazarên Kurdistanê weke bajar û deverên din yên Îranê nearam e.**

Heta piştî axavitnên Rohanî û hewlên rejîmê ji bo baştirkirina bazarê, xelkê tu hêviyeke wan bi pêşerojê nemaye.

Çalakvaniyekî aborî di Kurdistanê de, di pêwendiyekê de bi malpera "Kurdistanmedia"yê re, ragehandiye ku: "Tevî vê ku ev çend roj in ku desteya aborî ya Îranê ragehandiye, û serokê banka navendî bi pilanên nû ve îdi`a ya anîna xwarê a nirxa Dolar dikir, lê di nav bazarê de Dolar her buha ye".

Li gorî gotina navbirî xelk wisa dizane ku di baştirîn demê de, wê nirxa Dolar bibe 8 hezar Tûmen, lê rastiya bazarê heyanî niha tiştekî din dibêje, û wisa xuya ye ku di van demên nêzîk de Dolar wê nirxê bi xwe ve nabîne.

Ev çalakvanê aborî dibêje ku: "Di warê derûnî  de jî xelkê Kurdistanê bi axavtinên "Rohanî" û berpirsên din yên rejîmê  dilxweş nînin, û xelk wisa hesab dike ku axavtinên  hemiyan direv û henek in, û dibêjin kesayetiyên hemiyan ku yek ji van "Rohanî"yê serkomar e, di yek peyvê de dibînin, ev jî lêbandina xelkê ye".

Hevdem digel vê bêbaweriya ku di bazarê de heye, li hemberî rejîmê, û soz û qewlên wan çê bûne, hevwelatî jî bas ji binpêkirina hemû biyavên exlaq di Îranê de dikin û dibêjin, ev bi nav bazirgan bes ji bo qazancên xwe mejûlî sextekariyan di berhemên xwe de ne.
Hevwelatiyekî Kurdistanî di vê derheqê de ji bo zelalkirina zêdetir a vê mijarê bas ji "Çîpsa Mez Mez" dike û dibêje ku: "Ev çîpsa  di meha duyem a biharê de giran bûye û nirxa vê li 500 Tûmenî çûye bo 800 Tûmenî; Karxaneya "Mez Mez" a Îranê dema ku zanî bi 800 Tûmenî ev çîps ji bo van nayê firotin û di bazarê de tûşî pirsgirêkên firotinê wê bibin, bi kêmfirotinê di vê heyamê de, heta çend mehan derbaz kirin; wate kêşa çîpsê kêm kiribûn".
Eva di demekê de ye ku qebareya naylona çîpsê her wekî berê ye û tu guherînkariyek bi ser de nehatiye, lê çîps hatine kêmkirin û li gorî gotina navbirî bi dehan û sedan tişt hene ku ji aliyê sermayedaran û xwedî karxaneyan ve sextekarî tê de tên encamdan û serîgirêdana kiryar, armanca serekî a wan e.
Di dawiyê de jî dibêje ku: "Eva exlaqê bazriganên Îranê ye, ku hem sextet ye, hem kêmfiroşî û hem jî giranfiroşî ye".

# Jineke mamostaya xwendingehê, bû goriyê şaşitiya pizîşkan

**Di yek ji nexweşxaneyên bajarê Bane de, jineke hamile (pêgiran) piştî ku ducaran hate emeliyatkirin, canê xwe ji dest da.**

Li gorî nûçeya ku gihîştiye Ajansa "Kurdpa"yê, roja Înê 10`ê Tebaxê jina hamile (pêgiran) ji ber êş û azara zaroka xwe, ev ji bo nexweşxaneya "Razî" a bajarê Bane veguhastibûn, û piştî ku du caran tên emeliyatkirin jiyan xwe ji dest dide.

Nasnameya wê jina Kurd, "Çîmen Direxşanî" temen 38 salî hatiye ragehandin.Li gorî çavkaniyeke agehdar di vê derheqê de, zaroka wê jina Kurd çend rojan berê canê xwe ji dest dabû, lê ew agehdarê vê mijarê nebibû, û piştî wergirtina zanyariyan li nexweşxaneyê,û bêencambûna du caran emelatiya pizîşkî, jiyana xwe ji dest dide.



Li gorî gotina vê çavkaniya agehdar, ev jina mamosta ya Kurd, bi sedema hebûna zaroka mirî di nav zikê wê de , du caran hatibû emeliyatkirin û her ev yek jî bû sedema can jidestdana wê. Ev jina Kurd roja derbazbûyî 11`ê Tebaxê, di nexweşxaneya "Razî" a bajarê Bane de jiyana xwe ji dest da.

Di demên berê de jî, berpirsê Saziya Pizîşkê Yasayî ê Îranê, bas ji bilind bûna asta cezayê pizîşkî di Îranê de kiribû, û ragehandiye ku: Amarên "şaştiyên pizîşkî" dî vî welatî de ber bi zêdebûne ne.

**Belgefîmek derbarê rewşa jiyana kolberan li navçeya Mirgever a Urmiyê, hate berhemanîn û belavkirin.**



**Li gor zanyariyên ajansa nûçeyan a "Kurdpa"yê, Belgefîlmek bi navê "Kolber" bi zimanê Kurdî bi derhêneriya "Mecîd Rizayî" û "Mihemedsalih Şuca`i" li navçeya Mirgever a Urmiyê hate berhemanîn.**

Ev belgefîlm, îsal buharê hatiye berhemanîn û balê dikşîne ser rewşa nebaş a aborî a xelkê vê navçeyê ku ji ber wê, gellek kes bi neçarî li sînorên Urmiyê kolberiyê dikin.

Derhênerên vê berhemê ji temaşevanên vê dixwazin di rewşên herî xirab ên jiyanê de jî, ji bo debara jiyanê, kolberiyê nekin.

"Ronahî Fîlm a Zêwe" ev belgefîlm belav kiriye. Kolber, ji kesên zehmetkêş re tê gotin ku ji bo debara jiyanê, li sînorên Kurdistana Îranê bi pişta xwe kelûpelên giran tînin û dibin.Tevî ku karê wan pirr metirsîdar e jî, lê kolber ji bo dabînkirina pêwîstiyên jiyana xwe, û ji ber hejarî û destkurtiyê bi neçarî li navçeyên sînorî ên Kurdistanê, vî karî encam didin.

# Hesen Şerîf: Pêşmergetî qonaxa zêrîn û bi rûmet a jiyana min bû



H: Darbaz Younis

**Hunermendê navdar ê Kurd Hesen Şerîf niha li gel hunermenda Kurd Rojda ji bo klîba stranekî kar dikin ku behsa jenosîda li ser gelê Kurd dike.**

Hesen Şerîf, ku berê pêşmergetî jî kiriye, gelek caran stranên li ser xak, nîştîman, netew û pêşmerge çêkirine û gotiye. Ew niha li derveyî welat dijî û di vê hevpeyvînê de ji Rûdawê re behsa karên xwe yên hunerî û herwiha rewşa îroyîn a hunera kurdî dike.

Beriya hemû tiştan vê bipirsim, çima vegeriyayî Kurdistanê?

Ez ji bo klîba straneke nû hatime Kurdistanê. Li gel hunermenda navdar a Bakurê Kurdistanê Rojda klîbekî amade dikin. Gotinên vê stranê yê mamoste Emîn Botanî ye û behsa jenosîda li ser gelê Kurd dike. Berhemê Tora Medyayî ya Rûdawê ye û spasiya we dikim ku ji bo berhemanîna vê klîbê we hevkariya me kir.

Ji bo klîba vê stranê we çima navçeyên dîrokî yên Kurdistanê yên wek Kelha Şêrwane ya li Kelarê, Qişleya Koyê hilbijart?

Ev stran behsa janosîda li ser gelê Kurd dike, lewma derhênerê klîbê Kak Saman Ednan biryar da em li van deran dîmenan tomar bikin.

Beriya niha te strana bi navê "Reş û Şîn" belav kirk u behsa bûyerên 16ê Cotmehê dike. Dixwazim mebesta vê stranê fam bikim?

Mebesta vê stranê zelal e û behsa îxaneta mezin a 16ê Cotmehê dike. Min jî wek hunermend hez kir di vê derbarê de stranekê bêjim ku tê de dibêje: "Şivanê me gur anî û berda nav mîh û pezan." Tekst û awaza vê stranê jî yê mamoste Emîn Botanî bû û ez pir spasiya wî dikim.

Ti planeke te ji bo belavkirina albûmeke nû heye?

Karê ji bo albûmeke stranan zehmet e, bi taybetî jî niha. Ji ber vê yekê ji bo demeke nêzîk planeke min a wiha nîne. Ez karên xwe bi sîngil belav dikim. Hunermendên Kurd ji karên hunerî dahat bidest naxin. Lewma berhemanîna albûê pir zehmet e.

Baş e ji bo konsertan? Tu li Swêdê dijî, li wir rewşa konsertan çawa ye?

Bi giştî li Kurdistanê çanda aheng û konsertan kêm e. Lewma rewşa konsertên stranan bi giştî li Kurdistan û Ewropayê jî ne baş e.

Tu hunermendekî ku li ser hemû babetan stranan dibêjî. Hertim dibêjin zarok û genc û pîr û kal guhdariya Hesen Şerîf dikin. Tu çi dibêjî di vî warî de?

Ev armanc û plana min e, divê hunermend di hemû rewşan de di hemû babetan de stranan bêje.

Dikariğm pirsa qonaxên jiyana te bikim?

Ev 20 sal in ez li Ewropa dijîm. Beriya wê pêşmerge bûm û jiyaneke min a zehmet û giran hebû. Lê ez pêşmergetiyê weke qonaxa zêrîn û bi rûmet a jiyana xwe dibînim.

Tu giringiyê didî nûkirina stran û folklore. Ev ezmûn ji bo te çawa ye?

Bi nêrîna min hunermendên kevn û hunera kurdî gencîneyeke mezin in. Weke hunermendên îro me arşîveke mezin û dewlemend heye da bikarin li ser kar bikin. Nûkirina stranên folklorî jî kareke ku divê were kirin. Pêwîste em hunera xwe nîşanê genkan û nifşên nû bidin. Ev erkê hemû hunermendan e.

Tu li gel hunermend Dilşad Seîd beşdarî şakara Pêşmerge û Şingalê bûyî, ev ji bo te ezmûneke çawa bû?

Bi nêrîna min ew şakar karên pir mezin bûn û divê hemû Kurd pê serbilind û şanaz bin. Birastî ezmûneke pir bêwêne bû û ti caran ji bîr nakim. Rudaw

# Berhemên dengbêja Kurda Xurasanê "Banû Şîrwanî" tên berhevkirin

**Enistutuya Kelepûra Kurdî berhemên Banû Şîrwanî ku ji xelkê Xorasanê bû, kom dike.**

Hunermenda Kurda XorasanêBanû Şîrwanî yek ji wan jinan e, bi dengê di dilê kurdên her parçeyên Kurdistanê de cihekî taybet ê xwe heye.Enistutuya Kelepûra Kurdî 9 berhemên Banû Şîrwanî komkirine, ku di sala 1956an de li beşê Kurdî yê Radyo Meşhedê hatine belavkirin.Banû Şîrwanî ku navê wê yê rastîn Mahbanû Ebbasî bû sala 1929 li gundê Welîawadê yê ser bi bajarê Qoçanai parêzgeha Xorasana ve li Bakurê Rojhilatê Îranê ji dayik bûye û ew stranbêja yekem jina kurd bûye, ku li Rojhilatê Kurdistanê bi Kurmancî stran gotine.Piştî li Komara Îslamî ya Îranê muzîk ji bo jinan qedexe kir û vê yek bandor li karê Banû Şîrwanî jî kir û ew neçar dibe karê xwe rawestine.Banû sala 2004ê li Meşehdê wefat kir û gelek stran û awazên kurdî ji bo kelepûra kurdan weke mîratê li dûv xwe hişt.Zanyar Husênî ku bi karê berhevkirina stranên Banû Şîrwanî ve mijûl e dibêje wî berê 5 salan serdana bajarê Xorasanê kir û derbarê çend dengbêjên Kurd taybetî derbarê Banû Şîrwanê de lêkolîn kiriye û heta 100 stranan berhev kiriye. Berpirsê Arşîva Deng û Dîmenan Enistutuya Kelepûra Kurdî li Rêjen Hesen jî bal kişand ser girîngiya berhevkirina stranên dengbêjî û got ew niha hewl didin çend staranên Banû Şîrwanî bi qalityek baş û dengekî paqijkirî pêşkeşî bazarê bikin.

# Zimanê Kurdî

Ev cînav (xwe, kî, çi), bi şêweyekî rast û rewa cihên navan girtine . Anku, li şûna ku em bibêjin :

- Serdar alîkariya hevalê (Serdar) dike .
- (Remo) yê biçe daristanê
- Dengê (daholê) tê me

Me ev cînav (xwe, kî, çi) li şûna navên (Serdar, Remo, daholê) bikar anîne . Xebitandina cînavan deqqa axavtinê ji dûbarekirina navan rizgar dike . Ev jî, rewanbêjiyekê bi ser şêwazê axavtin û nivîsînê ve ber dide . Nimûne : (Zîn çû mala bavê xwe, cejna bav û birayên xwe pîroz kir .Bavê zînê diyariyek da wê û diya wê jî diyariyek da wê . Zînê xatir ji wan xwest û vegeriya mala xwe) . Ev nivîsar, bêyî cînavan, bi vî şêwazê xav û lihevgeryayî tê : (Zîn çû mala bavê (Zînê), cejna bav û birayên (Zînê) pîroz kir . Bavê Zînê diyariyek da (Zînê) / diya (Zînê) jî diyariyek da (Zînê) . Zînê xatir ji (bav, dê û birayan) xwest û vegeriya mala (zînê) . Bêguman, rewanbêjiya her dû deqqan ji hev cuda ye. Ev cudahî jî, girîngiya rola cînavan diçespîne .

Beşên cînavan :

Berî nuho me dît, çawa her Zimanzanekî Kurd, li gora baweriya xwe, cînav dabeş kirine û her beşek ji wan bi navekî daye nasîn . Piştî ku ez li ser wan cînav û navlêkirinan rawestiyam û min ew beranberî hev kirin, ez gihiştim baweriyekê, ku di şêwezarê kurmanciya jorîn de, cînav bi van beşan parve dibin:

1- Cînavên kesîn 2- Cînavên pirsiyarî 3- Cînavên nîşandan 4- Cînavên bêhêl (bêlayen) 5- Cînavên girêkî 6- Cînavên peywendî (heyî) 7- Cînavên nenas (nebinavkirî)

Ji bilî van her heft navlêkirinên cînavan jî, şarezayên zimanê kurdî çend navlêkirnên dîtir destnîşan kirine . Wek :

Cînavên (bihevîn, lihevxistî, xweyî, xwedîn, heyî destdanî, bîrdar, hevdûdanî, yektirî, zîvirandî, hevayî û bêhêz) . Helbet, min ev cînav hemû bi van navan nedane ber vê ravekirina xwe . Hindek ji wan (li gora baweriya min) ne cînav in . Hindek jî, bi navinî dîtir ketine ber şirovekirinê .

Wek : 1- Seyda Reşîdê Kurd ev pirtikên bêjeyan (im, î, e, in) kirine cînav û bi navê “bernavên dûmdar” ew rave kirine . Lê Dr. Qenatê Kurdo ew pirtik bi navê (paşkokan) pêşberî xwendevanên xwe kirine. Pirraniya şarezayên zimanê kurdî, yên her dû şêwezaran (K J) û (K X) ew kirine karê (bûnê) di dema nuho de . Ez jî dibînim ku ev pirtikên bêjeyan, ne cînav in . Ji ber vê egerê jî min ew paşguh kirine .

2- Ev her dû cînav (hev, xwe) di pirraniya nivîsarên rêzimanî de bi navê cînavên (hevayî) û (xweyî) hatine danasîn . Min ew her dû cînav û hinin dîtir jî, bi navê cînavên (bêhêl) şrove kirine . Her wiha cînavinî dîtir jî, bi navinî dîtir hatine ravekirin . Di pêvajoya şirovekirinê de, ev pirsgirêka navlêkirinên têvel, dê bêne ronîkirin .

# Tiştonek



A: Mahir Berwarî

- Zerê zeranî, li nav mêzera kitanî, ne li erdî ne le asmanî.
(* zerkahêkê)

Kilawî Hemze palewan, bê têkel û bê derman.
Hêskey kadîn e, çi pêpilkey nîne, mirdî têda jîn e.
Sênî û fexfûrî awî du reng e, be sardî sil e be gerî tung e.
Ne mirîşk e ne barok e, be serî xoy dada spî çarok e.

- Şûtî şetriqî, dam le berdî ne teqî.
(* Kîsel/kusî)
Pîrî bin gilî, delêy berd e bin hengilî.
Piştî berd e ber niye, 4 pêy heye ker niye, ka xor e û ker niye.

- Qurr e şînê bê mû, eqîrrênê zû zû. (* Boq/beq)
Merre kerey bin gewerrê, heldeperrê na lewerrê.
Şilî qûlî bê muw e, qirr e qirrî le duwe.

Têdîtin: Amadekar destkariya devoka metelokan nekiriye

**Xwendevanên hêja! Hûn dikarin bersiva tiştonekan bi riya E-Maila Agiri2003@gmal.com ji me re bişînin**

# Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (332)


## Çend wêneyên merasima 25ê Gelawêjê di binkeyên PDKÎ de

















